

# Ji bo swêdeka ewle û êmintir bixebite!

Tu pêwîst î! Tu bi çî awayî karibî, di serkeftineka hilbijartinê ya sosyaldemokrat de beşdar bibe. Bi hevarek, hevkarêk yan çîranekî re bipeyive yan di kampanyaya hilbijartinê de bi me re be. Bibe endamê Partiya Sosyaldemokratê!



Me bi rêya  Facebook  Instagram  Twitterê bişopîne

Ez dixwazim bibim endamê Partiya Sosyaldemokratê

Ez dixwazim hûn nûçeyên xwe ji min re bişînin

Nav .....

Telefon ..... E-poste .....

Navnîşan .....

Nimreya posteyê û cih .....

Nimreya şexsî [Personnummer]

Here malpera [socialdemokraterna.se/bli-medlem](https://socialdemokraterna.se/bli-medlem) yan vê formê dagire û têxe zêrfeqî û ji me re post bike. Vê navnîşanê binivîse, hingî pol hewce nake:

Socialdemokraterna  
Svarspost  
Kundnummer 110 651 700  
110 03 Stockholm

Em dê agahdarîyên te biparêzin. Di [socialdemokraterna.se/integritetspolicy](https://socialdemokraterna.se/integritetspolicy) de zêdetir bixwîne

Nordkurdiska



Socialdemokraterna

Ev tekstî jî teksta orîjînal bo swêdîya hêsan hatiye vanivîsîn. Heger cudahi di wateyan de di navbera her du versiyonan de hebîn, versiyona orîjînal bîngêh e.

**CIVAKEKA  
XURTTIR.  
SWÊDEKA EWLE  
Û ÊMINTIR.**

# CIVAKEKA XURTTIR Û SWÊDEKA EWLE Û ÊMINTIR HILBIJÊRE!


**Ez dizanim ewlehî û êminî ji bo mirovî çî qas giring e.** Ez ji mezinbûna xwe wek zarokê zirmalekê, ji bêkarên yên ku min di dema xwe ya pîşesaziyê de dîtine û ji hemû salmezinan yên ku ez wek serokwezîr îro dibînim vê yekê dizanim: divê her dem ewlehî û êminî hebe da ku em hest bi serferazî û azadiyê bikin.

**Niha hêzeka mezin di aboriya Swêdê de heye.** Ji 2014ê ve, 300 000 kes zêdetir kar dikin. Piştî 16 salan, bêkariya ciwanan niha di asta herî kêm de ye. Me berê siyaseteka koçberiyê ya têkçûyî guhart û weha kir ku ji 1981ê heta niha hejmara kesên yên ku îro bi alîkariya civakî tîrên xwedî kirin ya herî kêm be.

**Em dixwazin vê hêz û xurtiyê ji bo pêkanîna bernameya ewlehî û êminiyê ya herî mezin di serdema nû de bi kar bînin.** Armanca me civakeka xurt e. Ku hêza wê hebe ku kardarên zêdetir li dibistan û lîsên nexweşan bi cih bike û bixebite ji bo ku salmezî nebe feqîr. Ku hêza wê hebe têkoşîneka bêrawetan di tawankariyê bi rê ve bibe. Ku bixebite ji bo ku kî dikare kar bike bi rastî jî kar bike. Ku ji bo te hazir be gava hewcedariya te bi alîkariyê hebe lê ku şert û mercan jî datîne. Ku hêza wê hebe ku pirsgerêka cudakirina civakî jî binî û bi cidî bigire da Swêda me bi hev re bimîne.

**Lê bijartin ya te ye.** Ji xeyrî me hin hene ku ji bo dibistan û lîsên nexweşan çareyên bazarî yên zêdetir dixwazin. Ku dixwazin pereyan bi awayekî bi kar bînin ku ji bo kesên xweşhal û heyî cardî bacê pir kêmtir bikin û bihelîn xelk bi rêya refahiya lawaztir heqê wê bacê bidin.

**Daxwaza min a herî bicuk ji te eve:** Di avakirina civakeka xurtir û Swêdeka ewletir û êmintir de beşdar bibe. Partiya Socialdemokratî di 9ê îlonê [septemberê] de hilbijêre!

  
Stefan Löfven



# BERNAMEYA EWLEHÎ Û ÊMINIYÊ YA HERÎ MEZIN DI SERDEMA NÛ DE

## EWLEHÎ Û ÊMINÎ BI RÊYA REFAHIYETKA XURTTIR

**Em dixwazin:**

**Zêdetir karmendan di warê tendirustiyê de teyîn bikin.** Em dê herî kêm 14 000 kardaran zêdetir di warê tendirustiyê de bi cih bikin da ku barê karmedan sivik bikin, dema wextveqetandina nexweşan kurt bikin û xizmetên lîsên zûtir bidin.

**Nêçîra bidestxistina qezencê di warê tendirustiyê de rawestînin.** Em dê tedbîrên bisinorkirina qezenckirî û qaîdeyan pêk bînin da ku pereyên ji bo refahiya bigehin refahiya. Em dê dibistanên dîni jî qedexa bikin.

**Meaşê teqawidiyê bilind bikin.** Kesên ku di hemî jiyana xwe de bi meaşê kêm kar kiriyê dê bi rêya îlaweyekê li ser teqawidiya giştî meaşê teqawidiyê yê bilindtir bistîne û em pê gava dawiyê bavêjin ji bo ku baca teqawidan ya neadil bi yekcarî nehêlin.

## EWLEHÎ Û ÊMINÎ BI RÊYA TEKOŞÎNA DIJWAR DIJÎ TAWANKARIYÊ

**Em dixwazin:**

**Zêdetir polîsan teyîn bikin.** Em dê 10 000 kesên zêdetir heta sala 2024ê di pîşeya polîsiyê de teyîn bikin da ku

karibin hejmareka zêdetir ji tawankariyan çare bikin û ewlehî û êminiyê li kolan û meydanan peyda bikin.

**Şideta dijî jinan rawestînin.** Em dê şideta mêran ya dijî jinan, şideta "girêdayî namûsê", laşfiroşî û bazarkirina mirovan nehêlin.

**Rê li ber ciwanan bigirin ku bikevin nava tawankariyê.** Em dê siyasetekê bi rê ve bibin ku erîşî ser reha tawankariyê bike ew jî bi rêya kêmkirina ferq û cudahiyan û nehêlana bêedaletiyê û bi rêya tedbîrên zû û rêyên zêdetir yên xelasbûna ji tawankariyê.

## EWLEHÎ Û ÊMINÎ BI RÊYA TEVIKARIYA BILEZTIR

**Em dixwazin:**

**Bixebitin ku her kes, cins û esilê wî çî be bila bibe, kar bike.** Em dê ji bo şertên karî yên baş û meaşên cezab bi cidî tê bikoşin. Em dê bi rêya tedbîrên mezin yên di warê perwerdeyê de îmkanan peyda bikin ku her kes kar bike. Di heman demê de, em bi zelalî dibêjin ku rêya ku kesek bibe beşek ji Swêdê di xwexwedîkirina şexsî de derbaz dibe.

**Hêzên cudaker rawestînin.** Em dê hemû awayên ekstremîzma siyasî û dîni ya çekdar nehêlin.

**Mecbûriya fêrbûna zimanî bi cih bikin.** Her kes yê ku ji ber ku zimanê swêdî nizanê nikare kar bike, divê fêrî zimanî bibe.